## Têketina sepanê a ewil

Ji bo têketina sepanê a tijekirina forma qeyd-tomarkirina Daxwaznameya Parastina Navnetewî pêwiste hûn van gavên li jêr tên gotin bicîhbînin.

Gavên 1 & 2 dema hûn dikevin sepanê wê li ber we xwiyabibin.

**BALDARÎ**: Heke temen-emrê we di bin 18 salî re ye, û kesekî bi ser hîjdesalî re ku ji bo lênêrîna we berpirsiyar bi we re nîne, li gorî qanûna yûnan divê hûn vê formê tijenekin. Ji bo pêvajo were temamkirin, divê hûn serî li saziya berpirsiyar bidin.

**<u>Gava1: NASANDİN</u>**

| | |
|---|---|
| **Hêjmara Pêşdaxwaza(pêştomar) Penaberiyê** | Hêjmara Pêşdaxwaza (pêştomar) Penaberiyê binivisînin, ev hêjmar ji aliyê saziya berpirsiyar ve dane we û ev hêjmar li ser belgeyên we ê fermî ku saziya berpirsiyar dane we hatiye nivîsandin. |
| **Paşnav** | (2) tîp-herfên ewil ê paşnavê xwe bi latînî û bi herfên mezin binivisînin, divê ev paşnav wek dema pêvajoya tomarkirina ewil ku we ji saziya berpirsiyar re diyarkiriye be, û wek li ser belgeyên fermî ku saziya berpirsiyar dabûn we tên nivisandindin be. |
| **Nav** | (2) tîp-herfên ewil ê navê xwe bi latînî û bi herfên mezin binivisînin, divê ev nav wek dema pêvajoya tomarkirina ewil ku we ji saziya berpirsiyar re diyarkiriye be û wek li ser belgeyên fermî ku saziya berpirsiyar dabûn we tên nivisandindin be |
| **Roj-tarîxa ji dayîkbûnê** | Roja jidayîkbûna xwe wek dema pêvajoya tomarkirina ewil ku we ji saziya berpirsiyar re diyarkiriye binivisînin. Bi vî awnayî roj/meh/sal, mînak 1'ê Çile 2000, divê wisa 01/02/2000 ή 1/2/2000 were nivîsandin. |
| **Hêjmara telefona mobîl** | Ji bo têketina sepanê telefona xwe a ku hûn dixwazin koda ji bo carekê ji were şandin binivisînin. Ji bo ku hûn berdewambikin divê vê kod'ê di Gava2 da têkevinê. |
| **Ez ne makîne me** | Karekterên ku hûn di wêne da dibînin binivisînin. Di nava karekteran da hêjmar û tîp-herf henin. Heke ev nivisên ku hûn dibînin zehmet bin, hûn dikarin pêlî bişkoka«nuhkirin captcha» bikin, daku herf û hêjmarên hêsantir derkevin. |

**<u>Gava2: TÊKETİNA KOD</u>**

Dema hûn pêlî **«Têketin»** ekrana nasandinê dikin, û heke bi serkeftî hûn hatin naskirin, pişt re wê tijekirina koda şeş hêjmar ji we were xwastin, ev kod wê were telefona ku we di Gava 1 da we diyarkiribû.

**<u>Gava3: ZİMAN</u>**

Piştî têketina bi serkeftî a koda ji bo carekê, divê hûn **zimanê** ku hûn dixwazin formê tijebikin hilbijêrin

**BALDARÎ**:Ev hilbijêr a dawîn e-nîhayî ye. Heke hûn bixwazin zimanê tijekirinê bidin guhertin, hemû şûnên formayê wê werin jêbirin û divê hûn ji nuh ve tijebikin.